

Sî sal li ser mêjûwa Komela
Xwendevanên Kurd li
Ewropa de

Dr. M. S. Cuma

-Berlin, di 15. 6. 2000 de-

Çapa Duwem

-Berlin, di 15. 6. 2000 de-

-Çapa Duwem-

Sî sal li ser mêjûwa Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de

Ji 10-16 awgosta sala 1956 de li bajarê Wiesbaden de li Elmanya Ferderalî de Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de hate bipêkhatin. Ev bû sî sal, ku li ser pêkhatina vê komela hanê de hatîye bederbaspîn. Sî sal bi demeke kurt ve di mêjûwa merovanîyê de, di mêjûwa miletan de, di mêjûwa sazmenî û rêxistinan de tete biderkevtin; lêbelê sî sal di mêjûwa xebata gelê Kurd de û bi taybetî ve di xebata Xwendekarên Kurd de li Ewropa de rûpelekî pir geş û xweş ji bona xebata gelê me, belê ji bona pêşvexistina vê xebatê di hemû warî de dide biderxistin.

Xebata Xwendekarên Kurd li Ewropa de bi beşekî ve ji xebata hemû Xwendekarên miletên Jêrdest li seranserî cîhanê de bi dijî kevneperestî, Serdarên Bêgane û herwehaji bi dijî sustêma kolonyalîyê û impiryalîyê ve tete biderkevtin.

Di vê sala hanê de, di sala 1956 de xebat li seranserî cîhanê de, li Asya, Afrîqya, û Amerîka Latîni de bi dijî sustêma kolonyalistê ve hate bigeş û bigûrkin. Herwehaji di nava welat û miletê me jî de, yê ku ew jî bi beşekî ve ji hemû miletan dihate biderkevtin, ji yê ku wan di wê çaxa hanê de didatin bixebatkin, xebatê ji bona azadîyê û serxwebûna xwe ji nava lepên Bêganan bi xurtî ve date bidestpêkin.

Di sala 1956 de bûyînên mezin li seranserî cîhanê de dihatin bikin. Di vê sala hanê de, bi lurtî ve piştî pêkhatina Komela Xwendekarên kurd li Ewropa de, xebata miletê Misrê dihate bigeş û bigûrkin. Impiryalizmê û bi taybetî ve Impiryalizma Ingilîzî û Firensî bi alîkarîya leşkerê Israîlî ve hêrişeke sê qolîyî mezin ji bona ser Misrê datin bidadan, da ku ew careke din Misrê ji bona bin baskên xwe bidin bivegerandin û agirê xebata azadîya Afrîqa û li Rojhilata Navînî de bidin bitemirandin. Lêbelê bi saya xebata miletê Misrê ve û

herwehaji bi saya alikariya Sovyete mezin ve Impiryalîya Ingilîzî, Firensî û pêrejî leşkerîya Israîlî ketineke mezin datin bixwarin. Belê ev ketina hanê di mêjûwa Impiryalizma Ingilîzî de bi pêşî ve dihate biderkevtin û ew bi naçarî ve hatin bivekişandin û di seranserî cîhanê de herifandina Imperetoriya Ingilistanê û pêrejî ya Firensî datin bidestpêkirin.

Ev guhertina hanê di cara pêşî de di dunyayê di sal 1917 de date bidestpêkirin, gava ku Şûreşa Oktobera Mezin li Rusya de hate biserkevtin, ya ku wê yekek ji şeşemî zemînê date biazadkirin û pêrejî wê ji bona Yekkirtina Miletên Jêrdest û Çînîya Karker bi dijî Kolonyalizmê, Impiryalizmê û Kevneperestîyê ve date bibangkirin. Vê Şûreşa Oktoberî Mezin, ya ku wê li Rusya de date bidestpêkirin, dergehê mezin li seranserî cîhanê de li ber Miletên Jêrdest date bivekirin û bi herifandina Sustêma Kolonyalîyê û Impiryalizmê ve date bidestpêkirin.

Piştî Cenga Cîhanî Yekem û bi xurtbûna Sovyete ve herwehaji tevaya xebatên Miletên Rojhilat û Miletên din di seranserî cîhanê de û pêrejî xebata miletê Kurd jî dihatin bixurt û bigeşkirin.

Lêbelê Impiryalizmê careke din tevaya merovanîyê ji bona Cenga Cîhanîyê Duwem date birakişandin, da ku ew carekedin ji nû ve Welatên Jêrdest di nava hev de bidin biparvekirin. Dewletên Impiryalistî di vê cenga man û nemanê de bi pêxîla hevdû ve hatin bikevtin.

Di sala 1941 de dewleta Elmanîyî Faşî hêrîşek ji bona ser Sovyete date bibirin, da ku ew wê ji ser rûwê zemînê bide bihilanîn. Dewleta Sovyete bi mîrxasî û qehremanî ve rû li rû de beramberî Faşîyan hate birawestandin. Lê Sustêma Faşizmê bi alikariya Leşkerê Sor û Hêzên Hevalbendan hate birûxandin. Bi rûxandina Faşizmê rûpelekî nuh di xebata miletan de date bidestpêkirin. Piştî girtina paytextê Hetler di 8. 5. 1945 de û pêrejî Cenga Cîhanîyê Duwem hate bidawîkirin. Herwehaji Sustêma Kolonyalî bi taybetî ve Kolonyalîya Ingilîzî, Firensî, Holendî û yên din hatin biqelskirin.

Di vê sala 1956 de sînorê Kolonyalizmê û Impiryalizmê hate bixuyanîkirin, ku ew bi tena xwe ve nema dikarin serdarîkirinê li seranserê cîhanê de bidin bikir û ew li ser wê de bêtin bizalkirin.

Dewleta Sovyêti mezin piştê Misrê date bigirtin û leşkerên Ingilîz, Firensî û Israîl bi darê zorê ve hatin bikişandin. Ev hêrîşa wan bi derdekî mezin ve li ser serên wan de hate bigerandin, herwehaji xebata azadîxwaz li seranserê cîhanê de hate bigeş û bugûrkirin.

Dî wê çaxê de Komela Xwendekarên Kurd cara pêşî bû, ku wê amadebûna xwe date binaskirin, ku ew xwe bi leşkerê şûreşê ve ji bona Misrê bi dijî sustêma Kolonyalistîyê û Kevneperestîyê ve ji bona azadîya miletan û herwehaji ji bona azadîya Kurd dide bidanîn. Di mêjûwa komela me de cara pêşî bû, ku hêjî çend meh di ser pêkhatina wê re nehatibûn biderbaskirin, ku wê di nameya xwe de ji bona Ebdul-Nasir ev daxwaza hanêyê mêjûyî date bixuyanîkirin û pêrejî wê ji bona hemû miletê Kurd û ji bona cîhanê date binaskirin, ku xebata miletê Kurd bi beşekî ve ji xebata azadîxwa tete biderkevtin û pêrejî armancê wê di nava xebata miletan de bi dijî Impiryalizmê û Kevneperestîyê ve tete bicîhatin.

Di sala 1960 de bi biryara Yekitîya Netewan ve Sustêma Kolonyalîyê hate bihilanîn. Vaye, bêtir ji 153 dewletan hatin biazadbûn. Piranîya van dewletan li Afrîqa, Asya û Emerîka Latîni de têtin bidîtin û ew bi mafeyên xweyî siyasî ve hatine bigihandin. Lêbelê miletê Kurd ew nebes tenê bi mafeyê xweyî milî ve û bi pêkhatina çarenûsa xwe ve ne hatîye bigihandin, lêbelê wehwehaji hêjî ew bi bê mafe ve ji biçûktirîn mafeyê xweyî merovanîyê ve tete biderkevtin. Welatê wî tete bitalankirin û ew bi serdejî ve tetê bikolekirin û mîna Afrîqaya Jêrîn rehperestî li Kurdistanê de ji bal Serdarên Borcuwazîyên Turk, Ereb û yên Iranî de tete bicîhanîn.

Di sala 1957 de piştî pêkhatina Komela me bi salekê ve raperînek Kurd li Kurdistanê Iranê de di bin nav û nîşana Raperîna Ciwanrû de date bidestpêkirin. Lê rêjima Şahînsahî bi balafirên, gulên top û tankan ve date bixwestin, ku ew vê

Raperîna hanê bide bibêdengkirin û wê bide bi wêrankirin. Lê tevliwêjî de Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa de ev zor û sitema Şahînsahî li seranserî cîhanê de date bitazîkirin; ku belê Kevneperestên Xwînmijên Serdarên Bêganên Iranî didin bixwestin, ku ew vî miletê hanê bi carekê ve bidin biwêrankirin û wî ji mafeyê wîyî milî û merovanîyê bidin bibêpişk û bibêparkirin.

Cara pêşî bû, ku Komela me ev xebata hanê bi geşbûn ve date bixuyanîkirin; di dema ku miletê Kurd li Ewropa de bigir nedihate binaskirin. Xelkê nizanîbûn, bê kaKurd çîne. Wan her û her li ser dev û berdevkên Kevneperestên Xwînrîj û Xwînmijên Turk, Iranî yanî Şovînyên Erebi li ser Kur de dabûn bibihîştin, ji yê ku wan li ser Kurd de dabûn binivîsandin, yanî di nava wan name, nivîst û gotarên tîrş û tal de didatin bixwendin, ji yê ku ew ji bal Çihangerên Eropî de hatibûn binivîsandin, ji yê ku wan bi dûr ve yanî bi nêzîk ve miletê kurd bi nebaşî ve, gehjî bi dirbûn ve, gehjî bi keleşî ve, gehjî bi vî navî ve yanî bi yê din ve didan bixuyanîkirin, ku wan her û her Serdarên xwe li Ewropa de û Hevalbendên wanî Kevneperestên Sedarên Bêgane li Kurdistanê de didatin birazîkirin.

Di sala 14 gelawêjê de şûreşeke mezinî demokrasî û pêşverû û welatperwer li Iraqê de date bidestpêkirin. Tevaya Sustêma Kolonyalizmê li Iraqê de rehên wê hatin bilierizandin. Kevneperest û Hevalbendên Impiryalizmê hatin birûxandin. Padîsahî hate birûxandin, ya ku wê bi saya Impiryalizma Ingilîzî ve didate biserdarîkirin. Komara Iraqîyî şûreşgêr hate bipêkhatin.

Di vê dema hanê de miletê kurd û herwehaji meletê Erebi û hêzên pêşverû û demokrasî li Rojhilata Navînî û seranserî Cîhanê de bi vê şûreşa pêşverû û demokrasî ve li Iraqê de hatin bidilşadbûn û bextiyarbûn. Rêberê şûreşê Ebdul-Kerîm Qasin di destûra katiyî komarê de date bizanîn, Kurd û Erebi Hevbeşên welêtin.

Belê Barzanî, yê ku ew ji 17 hizêrana sala 1947 de piştî rûxandina komara Mehabadê li ser destên Şahê Iranê de bi alîkarîya Impiryalizma Ingilîzî û Emerîkî de bi neçarî ve wî

xwe dabû bikişandûn û ew ji bona Sovyêtê hatibû biçûyîn, ji wêderê careken din ji bona Iraqê hate bivegerandin. Miletê Iraqê bi Kurd û Ereb ve bi vegerandina Barzanî û Barzanîyan ve mîna Qehremanên Iraqê nebes ji yên Kurd herwehajî ji yên Ereb biberpêşkirin.

Çend xweşbû, çênd ew roja hanê di mêjûwa Iraqê de, belê herwehajî di mêjûwa Kurdistanê jî de geşbû.

Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa de ev bûyîna mezin di mêjûwa Iraqê de, ev bûyîna mezin di mêjûwa Kurd û Ereb de bi pîrozî ve, bi şabaşî ve, bi dilovanî ve, bi tevaya hêz û hinerên xweyî biçûk ve piştgirtkir. Tevaya hêz û hinera xwe wê ji bona liberxwedana vê şûreşa hanê bermaberî Kevneperestîyê û herwehajî hêzên Impiryalîyê datin bitirxankirin. Wê tavaya hêza xwe date biamdekirin û wê ew ji bona jêrdestên Rêberîya şûreşê ji bona parastina vê şûreşa hanêyî pîroz date bixistin.

Vê şûreşa mezin hêvîyeke gewre ji miletê iraqê re û herwehajî ji boma miletê Kurd date bivekirin. Bextiyarî û xweşbûn li Iraqê de roj bi roj ve geşdibûn. Komela me jî bi Pasevanekî bicûk ve ji bona danîna rêyekê ve ji bona Xwendevanên Kurd û herwehajî ji bona piştgirtina vê şûreşê dihate biderkevtin û wê durujmê dostanîyê di nava miletê Kurd û Ereb de didate biberz û bibalakirin û wê durujmê demokrasîyê li Iraqê de ji bona Kurd didate bixuyanîkirin, ku di vî durujmê hanê de qazanc û berjewendîya Kurd û Erb têde tete bidiyarkirin.

Her û her Komelê didate bixuyanîkirin, ku bes û bi tenha xwe ve li Iraaqueke demokrasî de miletê Kurd dikare bi armancên xwe ve bête bigihandin.

Komela Xwendekarên Kurd Wênerên xwe ji bona Iraqê dane bişandin û wan tevaya dilsozîya xwe û piştgirtina xwe di demên teng û tar de ji bona Şûreşa Gelavêjê datin bixuyanîkirin.

Lê ev şûreşa hanê, ev şûreşa weha bi hêvî û xweşbûn ve date bidestpêkirin, ya ku tevaya miletê Kurd û hejwehjî hêzên pêsverû li seranserî Rojhilata navînî de pê hatin bidilsadbûn û bibextiyarîkirin û pê hatin bihêvîbûn, careke din ji bal Şovînizma Erebî, Kevneperestîya Erebî û Kevneperestîya

Kurd jî de û bi serdejî ve ji bal hêzên Paşverû li Rojhilata Navînî de û nemaze hêzên Impiryalizma Ingilîzî û Emerîkî de, ev hêzên Reş, ev hêzên Ahruman ji bona Şûreşa Gelawêj hate biberamberîkirin û wan tevan bi hev re şerê wê dane bikirin.

Di encamê dawî de Rêberê şûreşê Ebdul-Kerîm Qasim siyaseta xwe date biveguhertin û wî jî date bixwestin, ku ew jî ji bona nava şapê dijî hêzên Demokrasî û Kurd bête bikevtin û Kurd di Lûla Erebî de bide bihilandin; ev milletê ku bi hezeran sal ve nehatibû bibijavtin. Weha Şivînizma Faşîya Erebî dita bixwestin, wisa bi bêdengî ve û bi hêsanî ve vî milletê bi hezeran sal ve mayîna xwe dayite biparastin û welatê xwe her û her bi goristaneke mezin ve ji bona hemû Dujminana dayite bikirin, ji yên ku wan dabûn bixwestin, ku ew bi ceng ve di nava Kurdistanê re bêtin biderbasbin, yanjî li ser wê de bêtin bizalbûn.

Kurdistan bi nav û deng ve dihate biderkevtin, ku ew bi cihê Pehlevanên Rojhilata Navînî ve tete biderkevtin.

Lê Şovînizma Erebî di navaxewin û xeyalan de dihate bijîyandin û Kevneperestîyê ew date biçavsorkirin û wê ew datin bigûr û biharkirin, tanî ku wê şer di 11 Êkula sala 1961 de li Kurdistan de bidestên Ebdul-Kerîm Qasim ve şerekî ne rewê date bivêxistin. Careke din ji nû ve Kurd li berxwedana man û nemana xwe de hate bineçarîkirin.

Komela ma Xwendekarên Kurd li Ewropa de bi tevaya hêz û henerên xwe ve, belê hêz û hinerên wê biçûkbûn, lê evaya malê bû. Bî vî rengê hanê ve li hemû bajarên Ewropa de, ji yên Kurd tede dihatin bidîtin, ew dihatin birêxistin û ew dihatin bidagirtin, ku wan ji bona hêzên pêşverû re rewş û zînetên Kurdistanê dinan bixuyanîkirin, ku milletê Kurd di bin rewş û zînetên dujwar têtin bijîyandin û ew li ber man û nemana xwe de didin bidan, herwehaj bê kanî çawan Şovînizma Faşîya Ereb dide bixwestin, ku ew vî milletê reben nebes tenê ji mafeyê wîyî merovanîyê û bi serdejî ve ji dewlemendbûna welatê wî nemaze ji 90 milyon ton ji nefta Kurdistanê, ya ku ew ji bal Faşîyên Ereb her û her tete bitalan din, bide bibêpişk û bibêparkirin. Serdarîya Erebîyî Bêgane Kurdistan didate bitalankirin û bi serdejî ve milletê kurd didate

bikole û bibendekirin. Wê tevaya siyaseta Afrîqya jêrî bi ser Kurdistanê ve didate bicihanîn û wê ew didate biwêrankirin. Komela me di vê dema hanê mêjûyî hanê de di mêjûwa welat û milletê me de cîgehekî gewreyî giring ji xwe re didate biwergirtin. Tevî ku jî di vê dema hanê de Şovînizma Erebi û Faşîya Erebi di bin hemû nav û nîşanan de hêrîşeke gewreyî mezin bi ser Komela me yî xweşevist ve didate bidadan; jiber ku bes û bi tenha ve vê Komela hanê bi dilsozî ve li xebata gelê kurd de didate bidan û wê Faşîzma Erebiyî û Şovînizma Erebiyî didate birût û qûtîkirin; belê wê ew rûwê wêyî reş li seranserî cîhanê de didate birûsar û bitazîkirin. Komela me ten li wan devavêtînen Berdevkên Şovîniyên ereb de her û her karê xwe li seranserî welatên Ewropa de didate bixurtîkirin û wê pêwendîyen xwe ligel hêzên pêşverû û azadxwaz de li seranserî Cîhanê de û nemaze ligel Xwendevanên Yekgirtina Cîhanî didate bitewîkirin.

Komela me di sala 1964 de di Yekîtîya Xwendevanên Cîhanê de hate biendamîkirin. Di mêjûwa Komele me de ev rojeke xweş bû, ev rojeke geş bû, jiber ku vê komela haneyî pêşverû û welatperwer ji sala 1956 de ji bona vê Endametîya hanê ve didate bikevtileft û bixebatîkirin. Di encamê dawî de ev xebata hanê bi Endabûna Komela me di Yekîtîya Xwendevanên Cîhanî de hate bitac û bixelatîkirin. Belê xebata Xwendevanên Kurd li Ewropa de bi serhêzên Şovînizmê ve hate biserkevtin; tevî jî ku ev hêrîşên nerewa ji valî û ji walî de ji bal hêzên Erebi de bi dijî Endametîya Komela me ve di nava Yekîtîya Xwendevanên Cîhanê de dihatin bikirin. Tevlivê jî de xebata Komela me bi ser ser van hêzên Reş ve hate bikevtin.

Dî 8. 2. 1963 de Şovînizma Faşîyî Erebi Rêjîma Ebdul-Kerîm Qasim date biruxandin û wê Sustêma Faşîzmê li Iraqê de date bidanîn. Vê rêjîma Faşîst ne bes tenê hêrîşeke mezin ji bona ser Kurd date bianîn, herweh jî wê didate bixwestin, ku ew hemû hêzên Demokrat û Welatperwerî Erebi ji rehan de bide biqirkirin; jiber ku Şovînizma Erebi û Faşîya Erebi bi Tirina Emerîkî ve ji bona ser serdarîkirîya Iraqê hatibû bihatin. Ev rastîya hanê ji me re careke din dide bixuyanîkirin, ku belê Miletê Azad Miletê din jêrdest nake. Vê Rêjîma hanê

hêrîşeke mezin li ser hemû hêzên Pêşverû, Demokrat û Welatperwerên Erebi de date bikin. Iraq bi zindaneke mezin ve ji bona hemû hêzên Pêşverû û Demokrat ve hate bikin.

careke din din Şovînzîma Erebi û Faşîya Erebi date bixwestin, ku ew hêrîşeke gewre ji bona ser Kurdistanê bide bibirin.

Komela me, Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa de ji bona hemû hêzên Pêşverû û Demokrat li seranserê Cîhanê de date bixuyanîkin, ku ev hêzên Faşîyî Basîyên Iraqê, Zarok û Sêwîyên Eflaq, ji yê ku wa serdarîya Iraqê bi Tirina Emekî ve bi destên xwe ve dane bixistin, ne bes tenê bi dijî milletê Kurd ve têtin biderkevtin, herwehaji ew bi dijî milletê Erebi ve bi xwe ve têtin biderkevtin. Herwehaji ew bi dijî hemû hêzên Pêşverû û Demokratên Rojhilata Navînî ve bi giştî ve têtin biderkevtin. Ew bi Pasevanên Impîryalîya Emerîkî ve li vê herema me de têtin biderkevtin.

Şerekî ne rewa date bidestpêkin. Basîyên Faşî dane bixwestin, ku ew teva Kurdistanê Iraqê bidin bisûtandin; belê gelê Kurd ji ser rûwê zemînê de bidin bihilanîn. Bi saxî ve wan bi sedan ve li bajarê Sulêmanîyê de dane bibinaxkin û wan ew dane biveşartin. Bajr û gundên me didatin bişewitandin û biwêrankin. Lê xeyalê Basîyên Faşî vala bû. Xebata milletê Kurd, ev xebata ku bi hezaran sal ve her û her têtê bikin, ev xebata ku her û her bi qehremanî û mêrxasî ve hatîye bikin, her û her ji bona liberxwedana xwe hatîye bikin, ku di encamê dawî de li ser destên pêşîyên me de Babilon û Nineva hatine birûxandin. Pêrejî Pêşîyên me derdekî giran û bi jan ve, yê ku ew nayête bijibîrakin, bi ser serê Zeyzefon ve berî zayîna Isa bi 401 salî ve dane bianîn, gava ku Zeyzefon di nava welatê me re hatîye biderbaskin. Wî ev derdên hanê di nivîsta xwe de di bin nav û nîşana Vegera Deh hezar û yek Supah de dayîte binivîsandin.

Basîyên Faşîyên Iraqê, Sêwî û Zîçên Eflaq dixwestin, ku ew Kurdistanê meyî sipehî û ciwan bidin biwêrankin û milletê Kurd bi carekê ve li ser rûwê zemînê de bidin bihilanîn; ku careke din navên Kurd û Kurdistanê neyêtin bi ser zimanan ve neyêtin bihatin.

Miletê kurd bi qehremanî ve, bi pehlewani ve din Rêberîya Partîya Demokratî Kurdistan de bi Serokatîya Barzanî ve li ber man û nemana xwe de didate bidan. Hêzên Pêşverû û Demokratên Ereb, herwehaji hêzên Pêşverû, Demokrat û Aştîxwaz li seranserî Cîhanê de û bi taybetî ve hêzên Dewletên Sosyalistî di bin Rêberîya Sovyêtê Mezin de bi xurtî ve piştî gelê Kurd di vê roja teng de dane bigirtin.

Sovyêta Mezin di Nota xwe de ji bona Iranê, Turkîyê, Surî û Iraqê de date bixuyanîkirin, ku ev bûyên li bakurê Iraqê de têtin bikin, ew li nêzikî sînorên Sovyêtê de bi dijî milletê Kurd ve têtin bikin, ku metirsîyekê ji bona ser aşîti û asayîşa welatê Sovyêtê dide bixistin. Ev bûyînen hanê divê bêtin birawestandin. Pêrejî Sovyêtê pirsîyarîya Kurd ji bona ber destên Rêxistina Civakî û Abûrîya Yekgirtina Netewan de li bajarê Cinêv de di dema civîne de date bixistin. Herwehaji Komara Mongoliya Gelêrî xweser pirsîyarîya Kurd ji bona ber destên civîna Yekîtiya Netewan li Neyoyorkê de di dema civîne de date bixistin; „jiber ku milletê Kurd ji bal rêjîma Iraqê de bi qirkirîne ve tete biberamberkirin“¹.

Ev tevde ji bona piştgirtina milletê gelê Kurd dihate bikin, di dema ku Surî leşkerê xweyî Yermûkê di bin Serdarîya Fehed El-Şair de ji bona ser Kurdan di hewara Basîyan de dabû birêkirin. Ev leşkerê bi paye û serbilind ve ji bona ser Kurdistanê hatibû biçûyîn. Weha wî didate bibawerîkirin, dê ew li Kurdistanê de ji xwe re syranekê bide bikin. Lê Pêşmergên qehreman, Pehlewanên mîna Hurmuz fêrbûneke mêrxasîyê bi Pêxwasên Basîyan ve dane bidan, ku wan

¹ Di salên Notî ji vî sedsalê me de di piştî rizgarîkirina Kurrdistanê de ji bin gemara Tapanên Dagîrkerên Ereb de ji Merovên Agehdar û Beşdar ve di pêwendîyên pir taybetîyî Barzanî û Sovyêtê de di seranserî mêjûwa xebata Barzanî de di vî nivsedsalê de bi destên min ve hatin bikevtin, ji yên ku ew pir bi giring ve di mêjûwa me de têtin biderkevtin û divê xelkên Kurdistanê li ser wan pêwendîyên qûl û kûr de bêtin biagehdarîkirin, da ku ew bêtin li ber Barzanîyê Nemir û siyaseta wî de ji bona serxwebûna Kurdistanê bêtin biliberkevtin. Lêbelê li vir de ez rûnkirînen li ser pêwendîyên Barzanî de ligel Sovyêtê de ji bona Barzanîyan û Mesud Barzanî didim bihiştin. Cuma

leşkerê Yermûk dane bibezaandin û bitarûmarkirin û di Turkîyê re hin ji wan dane biderxistin û ew bi darê zorê ve careke din bi ser şorî ve ji bona Surîyê dane bivegerandin.

Sento û Nato di rêya Iran û Turkî de didatin bixwestin, ku ew vê şûreşa hanê bidin bivemirandin. Şah û Turk leşkerên xwe li ser sînorên Kurdistanê de didatin bivandin, Wan çavên xwe ji bona hêrîşekê li ser Kurdistanê de didatin bibelkîrin. Herwehajî wan Civata Hevkarîya Leşkerî ligel Basîyan de li bajarê Musilê de dabûn bipêkanîn.

Bi saya xebata gelê Kurd, hêzên Erebyî Pêşverû ve û bi saya Deleta Sovyêtî û Partîya Lenin Mezin ve Şûreşa Kurdistanê ji rûxandinê hate biparastin.

Borcuwazîya Kurd ya gen û genî ev rastîya hanê date bijîbîrakirin û her wehajî wê didate bixwestin, ku ew vê ji mêjûwa Kurdistanê bide bijîbîrakirin, ku di emcamê dawî de ev jîbîrkirina hanê ji bal Borcuwazîya me de bi hoyê rûxandina wê ve hate bikirin.

Belê şureşa Kurd hate biparastin û Rêjima Basîyî Faşî li ser destên Abdul-Selam Arif de hate birûxandin. Wî şûna wan ji xwe re date bigirtin û lihevhetineke demî di navbera Arif û Barzanî de hate bikirin. Şer li Kurdistanê de hate birawistandin. Miletê Kurd piçekî bêha xwe date bivedan. Arif ji dêlva pirsîyarîya Kurd bide biçarekîrin, wî xwe ji bona ceng û şer li ser Kurd de didate biamadekîrin. Vî Milîvanê Erebi hîç bawerî bi canê demokrasîyê ve nebû. Bes û bi tenha ve wî ji xwe re xewin didatin bidîtin, bê kanî çawan bi başî ve dê ew vê veşartoka hêza liberxwedana Kurd bide bişikandî; hegerjî ne ew be bi aşîti ve bête bikirin, belê divê ew bi ceng û şer ve bête bikirin.

Komela me, Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa de her û her didate bixuyanîkîrin, ku bes û bi tenha ve pirsîyarîya Kurd li Iraqê de di rêya demokratîkirina civaka Iraqê de bi xwe ve dikare bête biçarekîrin.

Diktatorekî mîna Abdul-Selam Arif nikare vê pirsîyarîya milî li Iraqê de bide biçarekîrin; jîbervêjî ve Komela me her û her bi bîr ve didate bixistin, ku bes û bi tenha ve durujmê Demokratî ji bona Iraqê û Ewtonomî ji bona Kurdistanê her û

her bi rast û dirust ve têtê biderkevtin û li ser bingehê wê de bes û bi tenha ve pirsîyarîya Kurd li Iraqê de dikare bête biçarekirin. Bi ceng û şer ve ji bal Şovîniyên Rehperestên Faşîyên Ereb de xebate gelê Kurd li Kurdistanê Iraqê de nayête birawestandin û bitemirandin.

Komele me, Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa de, ya ku ew xwe bi beşekî biçûk ve ji xebata gelê Kurd dide bidîtin, her û her wê xebat ji bona vî durujmê hanê durujmê Demokrasî ji bona Iraqê û Ewtonomî ji bona Kurdistanê didate bikirin; jiber ku ev durujmê hanê tevaya qazanc û berjewendîya Kurd û Ereb dide bidîyarîkirin, belê têtê biderxistin û pêrejî pir pirsîyarîyên dujwar li pêşîya gelê Iraqê de ji bona pêşvexistina civakî û geşbûna abûrî li seranserî Iraqê de têtê têtin biçarekirin; da ku bextiyarî û xweşbûna jînê di tevaya geşbûna xwe de bête bederxistin û Iraqa Kurd û Ereb bi nimûne ve ji bona çarekirina pirsîyarîya Kurd li seranserî Kurdistanê de bête bikirin, li wan welatê ku Kurd ligel miletên Iranî û Turk de têtin bijîyandin.

Arîfê Yekem, piştî ku wî Basîyên Faşî li Iraqê de dane biserkutkirin û wî ew ji ber xwe dane biavêtin, carke din wî xwe ji bona ceng û şer li ser Kurdistanê de date biamadekirin û di encamê dawî de şerekî giran li ser gelê Kurd de careke din date bivêxistin.

Lê Pêşmergeên Qehreman û Merxasên Kurdistanê hêvîya gelê me di bin Rêberîya Barzanî de mîna Şêran li ber Şovinizma Erebî de bi peymanê: Kurdistan yan Neman ve hatin birawestandin. Hemû miletê kurd li seranserî Kurdistanê de bi dil û can ve piştî vê xebata dujwar dane bigirtin. Herwehajî Komela me, Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa de bi tevaya tuwana xwe ve, bi hemû karînen xweyî biçûk ve li seranserî Ewropa de piştî vê şûreşa Kurd û liberxwedana wîna date bigirtin. Wê Şovînistîya Erebî li seranserî Cîhanê de didate birût, biqût û bitazîkirin; bê çawan ev Çavsorên Şovîniyên Ereb didin bixwestin, ku ew dewlemendbûna welatê me bidin bitalankirin û hêjîbêtir bi serdejî ve ew dixwazin, ku miletê Kurd di vî di vî sedsalên bîştan de ji xwe re bidin bikole û bibendekirin. Xeyalê milîbûna Şovîniyên

Erebî careke din bi vala ve hate bidserkevtin. Emrê Arifê Yekem bi emrê pîvanokê ve hate biderkevtin. Ew di hêlokepterekê de hate bikevtin û ew hate bitopîn. Lê milletê Kurd bi serbilindî ve li ser çiyayên Kurdistanê de û di nava dest û newalên wî de hate bimayîn.

Arifê Duwem ji bona ser seradrîya Iraqê de hate bihatin. Şer her û her bi xurtî û tundî ve tanî sala 1966 de di şerê Sozik û Henderîn de berdewam bû, ku di van herdu şerên hanê de hestîyê piştî leşkerên Iraqê hate bişikenandin. Bi sedan ve leşkerê Iraqî termên xwe li Kurdistanê de li dû xwe de dane bihiştin û ew revîn: lingo bi qurbano.

Şerê Sozik û Henderîn bi şerên Qehreman û Pehlewanên Kurdistanê ve ligel Welatperwerên Ereb bi xwe ve tête biderkavtin. Rojekê li rojan de milletê Kurd di seranserîya mêjûwa şer de ligel Birayên xweyî Ereb de nedaye bişerkirin. Her û her durujmê biratîya Kurd û Ereb ji bal Dilsozên Kurdistanê de hatîye biberz û bibalakirin.

Barzanî di sala 1943 de di daxuyanîya xwe de ji bona gelê Kurd û Ereb dibêjê: Em şer ligel Ereb nakin; belê ew birayê me ye. Bes û bi tenha ve em şer bi dijî Serdarên wî ve dikin; ji yên ku ew bi Nokerên Impiryalizma Ingilîzî ve têtin biderkevtin. Ev rastîya hanê her û her Rêberîya Kurd di seranserî xebata gelê me de Kurd pê didatin biperwerdekirin. Barzanî hîç Rojekê ji rojan ve cudabûnek ji bona nava Xebatvanên Kurd û Ereb nedidate bixistin. Belê her û her hizkirina wî ji bona Xebatvanên Ereb bi bêtir ve dihate biderkevtin û rêzlêgirtina wîna ji bona Xebatvanên Ereb ji yên Kurd li nik wî de bi gewretir ve dihate biderkevtin. Wehajî Pêşmerge dihatin biperwerdekirin. Wehajî Endamên Komela li Ewropa de li ser dostanîyê de di nava hemû milletan de li seransî Cîhanê de dihatin biperwerdekirin; jibervêyekêjî ve Komela me durujmê dostanîyê, aşîtyê, belê biratîyê di nava Gelan de bi bendekî ve ji pênc bendên bigehî ve di destûra xwe de dabû bixistin.

Arifê Duwem piştî şikestian leşkerê wî li Sozik û Henderînê de bi rawestandîna şer ve û bi pêkhatina peymna 29 Hizêrana sala 1966 de hate bineçarbûn. Di vê peymnana hanê de

Rêjima Arifê Duwem bi hin daxwazên Kurd ve pê hate birûniştin. Serekê Wizîran wê çaxê Bezaz bû. Arifê Duwem ligel Bezaz de nedixwestin, ku ew pirsîyarîya Kurd bidin biçarekirin; belkî ku ew careke din bi aşîtî ve şûreşa Kurd ji hevdû ve bidin bixistin û ew kurdan xwe bi xwe ve bi bera hevbidin. Ev siyaseta hanê her û her Ingilîzan di tevaya serdarîya Imperetorîya xweyî kolonyalî de beramber bi gelên Jêrsete ve didatn bicihanîn. Ev siyaseta bi nav û bang ve: ji hev cihêkirin û serdarîkirin.

Bezazê Nokerê Ingilîz ev siyaseta hanê li Kurdistanê de date bicihanîn. Belê ev siyaseta çewt û xwar tanî demê hate biserkevtin. Kur pir pê hatin biazardan û biêşandin. Herwehajî Komela me jî bi vê siyaseta hanê ve hate biêşandin. Lê vê siyaseta hanêyî çewt û xwar hîç xwe nikarîbû li ber pêşveçûna xebata miletê Kurd de bide biragirtin. Xebata miletê Kurd her û her ber bi pêş ve dihate bikevtin.

Di sala 1968 de careke din Basîyên faşî bi wergerandina rêjîma Bezaz ve ji bona ser serdarîya Iraqê de hatin bikevtin. Careke din wan şerekî giran li Kurdistanê de datin bidadan. Careke din miletê me di bin Rêberîya Barzanî de bi qehremanî û mêrxasî ve û herwehajî hêzên pêşverû û demokratên Erebi beramberî Basîyan ve hatin birawestandin. Rewş û zîmeta Basîyan roj bi roj ve bêtir û bêtir nebaştir dibû, ku ew di encamê dawî de ligel Kurd de bi lihevhatina 11 Avdara Sala 1970 de hatin bineçarkirin. Ev lihevhatina mêjûyî di xebata Iraqê de bi saya xebata miletê Kurd ve, bi saya xebata miletê Erebi ve li Iraqê de û herwehajî bi yarmetîya gewreyî Sovyêtê Mezin ve ji bona Erebi û kurd ve bi vê lihevhatina mezin ve hate bicîhatin.

Peymana 11 Avdarê rûpelekî mêjûyî nuh li Iraqê de date bivekirin. Aşîtî li Kurdistanê de careke din hate bidîtin. Tevaya gelê Iraqê bi vê peymanan hanê ve pê hate bidilşad û bibextiyarîkirin. Li seranserî welêt de govend û dilan bû. Miletê Iraqê bi carekê ve ji dil û can piştgirtina vê peymanan mêjûyî didate bigirtin. Hemû hêzên pêşverû li seranserî Cîhanê de bi vê peymanan pîroz ve dihatin dilşadbûn û wan gelê Iraqê bi vê lihevhatina mêjûyî dve di navbera Rêberîya

Kurd de bi Serokitîya Barzanî ve, bi Serokitîya Hesên El-Bekir ve û bi Serokitîya Sedam Husên didatin bipîrozkerin.

Peymana 11 Avdarê cihekî xweş ji bona xebata gelê Iraqê bi dijî Kevneperestîyê û Hêzên Impiryalîyê ve date bivekirin. Hêzên Pêşverû li seranserê Rojhilata Navînî de bi vê lihevhatina mêjûyî de hatin bidilşadbûn û wan tede jî xurtbûna xwe bi dijî Kevneperestîyê û Impiryalizmê ve didatin bidîtin. Bes û bi tenha ve Partîya Bas li Surî de di bin Rêberîya Qiralkê Erebbî Eflaq de daxuyanîyek dût û dirêj bi dijî Peymana 11 Avdarê date biderxistin. Vê partîya hanê hêrîşeke mezin ji bona ser vê peymana mêjûyî di mêjûwa gelê Iraqê de date bianîn.

Şovînîzma Erebbî hîç jî serpehatîyên Gelan û hêjbêtir ji mêjûwa xebata xwe jî bi dijî Serdarîya Bêgane ve nehatîye bifêrkirin. Gelê Erebbî xebateke dût û dirêj bi dijî serdarîya bêgeneyî Osmanî ve bêtir ji pêncsed salî de date bikirin. Wî jî daxwaza Ewtonomî ji xwe re didate bikirin. Herwehaja xebata wî bi dijî serdarîya Impiryalizma Ingilîzî û Firensî ve piştî Cenga Cîhanî Yekem dihate biderkevtin; jiber ku Impiryalizma Ingilîzî, Firensî û Rusî di Peymana Sayks-Pîko de di gulana sala 1916 de li bajarê Berûde de Rojhilata Navînîyî li jêr dewleta Osmanî de di nava xwe de dane biparvekirin. Wehaja pêrejî Kurdistan jî hate biparvekirin. Kurdistan, ji dêlva ku ew bi du perçe ve dihate biderkevtin, di piştî Cenga Cîhanîyî Yekem de li ser bingehên vê peymana hanê de bi çar perçan ve hate biparvekirin.

Basîyên Surî di bin Rêberîya Qele Erebbî de, di bin rêberîya Mişel Eflaq de ev rastîyên mêjûyî bi carekê ve didatin bijîbîrakirin û wan bi herawayekî ve didatin bixwestin, ku ew mîletê kurd di Lula Erebbî de bidin bihilandin. Bes û bi tenha ve Qiralkên mîna Eflak dikarin weha ziyane bi mîletê xwe ve bidin bigihandin û ew bi dijî pêşveçûna Merovanîyê ve bi rehperestî ve bêtin birawestandin.

Komela me, Komela Xwendekarên kurd li Ewropa de bi vê girêda Peymana 11 Avdara sala 1970 ve di navbera Rêberîya Kurd û Dewleta Iraqê de pê hate bidilşad û bibextiyarkirin. Wê bi hemû hêz û hinrên xwe ve li seranserê Ewropa de piştî

vê Peymana pîroz didate bigirtin. Ev Peymana pîroz ne bes tenê li qzanc û kara gelê kurd de dihate biderkevtin; lêbelêjî ew li berjewendî û qazanca gelê Ereb de bi xwe jî ve dihate biderkevtin, belê ew li qazanca hemû gelê Iraqê de dihate biderkevtin.

Cara pêşî bû, ku di mêjûwa Rojhilata navînî de pirsîyarîya Kurd bi şeweyekî demokrasî ve û bi rezamendîya gelê Kurd ve hatibû biçarekirin. Belê vî Peymana mêjûyî dergehêkî mezin li ber xebata Kurd de li seranserî Kurdistanê de date bivekirin û ew bi lêdaneke mezin ve ji bona Kevneperestîyê û Impiryalizmê dihate biderkevtin.

Çend hêzên Pêşverû bi vê Peymana mêjûyî ve dihatin bibextiyarkirin, weha deha hêzên Kevneperest û Impiryalyê pê dihatin bizikreş û bikînkirin. Wan tep, dolabên vîlik û pîlanên xwe li ser vê Peymana mêjûyî de didatin bitevinkirin. Kevneperestîya Erebî û herwehaji Kevneperestîya Kurd jî bi hemû karinên xwe ve bi dijî vê lihevhatina hanê de bi handana hêzên Kevneperestîyê ve li seranserî Rojhilata Navînî de û herwehaji pêrejî bi alîkarîya Impiryalizmê, nemaze Impiryalizma Emerîkî ve dihatin birawestandin.

Çarekirina pirsîyarîya Kurd li Iraqê de bi vê şeweyê demokrasî ve li ser berjewendîya Kurd û Ereb de bi mîxekî sengîn û dirêj ve di tabûta hêzên Reş de di Rojhilata Navîn de dihate biderkevtin. Herwehaji çarekirina vê pirsîyarîya milî li vî welatê hanê de bi yarmetîya Sovyêtê ve bi gîsnekî ve di nava çavên Impiryalizmê de dihate biderkevtin.

Berzbûna ala dostanîyê di nava Iraqê û Sovyêtê de di vî cihê giringî sitracî de li ser Tengava Farisî de pir bi metirsî ve dihate bidîtin, ji ya ku bêtir ji 80 tanî 85 der sed ji Tîna Çapan û Dewletên Ewropa Rojava tere têtin bibiderbaskirin. Lûlên neftê, rehên jîna abûrîya Dewletên Impiryalizmê tere têtin biderbaskirin. Ev cihê ku bêtir ji 60 der sed ji Nefta Cîhanê di Rojhilata Navînî de tere biderxistin. Belê bi dehan sal ve ew ji bal Kompanîyên Impiryalizmê de her û her dihate bitalankirin. Herwehaji Kurdistanê me jî tede ji 8 der sed ji tevaya nefta Cîhanêyî dozandî tere tere bidîtin.

Dostaniya Iraqê lîgek Sovyêtê bi qazanc, berjewendî û kara gelê Iraqê ve û herwehaji bi sûda hemû gelên Rojhilata Navînî ve dhate biderkevtin û ew zor bi Impiryalizma Emerîkî ve bi giran ve dihate biderkevtin; jibervêyeka hanê ve wê hemû hêz û hinerên xwe di Rojhilata Navîn de ji bona rûxandina vê peymanê mêjûyî di jîna gelê Iraqê de û herwehaji di mêjûwa Rojhilata Navîn de dane bikarxistin.

Şovînzîma Erebi bi carekê ve bi çarekirina pirsîyarîya Kurd ve li Iraqê de nedidate bibawerîkirin. Wê her û her didate bikarkirin, ku ew bi darê zorê û di rêya leşkerî de vê xebata gelê Kurd bide bişikenandin. Lê gava bi şer û ceng ve ew nehatin biserkevtin û pêrejî roj bi roj ve xebata Kurd ew bi pêrûniştina dozên Kurd ve didate bineçarkirin. Bi neçarî ve wê bi bê dilî xwe ve peymanê 11 Avdarê di sala 1970 de ligel Rêberîya Kurd de date bigirêdan, ji bona ku ew piçekî bêhna xwe bide bivedan û heger jî bête bikirin, ku ew bi aşîti ve şûreşa Kurd bide bixistin. Hêjîbêtir wê ji Dostên wê bide bidûrkirin. Şovînzîma Erebi xwe ji bona nava kirasê pêşverû date bixistin. Wê rûwê xweyî reşî Faşî bi pêşverû ve didate bixuyanîkirin û wê her û her ji rûxandina peymanê 11 Avdarê bi her awayekî ve didate bikarkirin. Wê şev û roj bi erebkirina Kurdistanê ve, bi girtin û kuştina Welatperwerên Kurd ve û herwehaji bi kuştina Idrîs Barzanî û Barzanî ve ji xwe re date bihewildan. Wê pilanek dabû bidanîn, ku ew bi yekcarê ve şureşa Kurd bide biwêrankirin.

Vê Rêjîma Faşî şev û roj xwe ji bona ceng û şer li ser Kurdistanê de didate biamadekirin. Piştî ku çar sal li ser Peymana 11 Avdarê de hatin biderbasbûn, bi alîkarîya Ingilîz ve Rêjîma Iraqê pilana xweyî Ewtonomî date bibelavkirin, ya ku ew li ser destên Ingilîz de jê re hatibû bidanin. Di vê pilana Dewleta Iraqê de tevaya Peymana 11 Avdara sala 1970 hatibû bihilanin.

Miletê Kurd bi rastî û durustî ve didate bixwestin, ku Peymana 11 Avdarê bête bicihanîn; jiber ku daxwaza gelê Kurd bi dadwerî ve dihate biderkevtin. Ji dêlva ku Rêjîma Faşîyî Iraqê guh bi berjewendî û qazanca gelê Iraqê ve bi giştî

ve bide bidan, wê şerekî man û nemanê li Kurdistanê de date bidadan.

Barzanî baş didate bizanîn, ku şer û ceng rojekê ji rojan li qazanca Kurd û Ereb de nebû. Ew ji dil û can dijî şer û cengê bû. Wî bi her awayekî ve ji bona Rêjîma Iraqê didate bibangkirin, ku ew vê pirsîyarîya hanê bi şeweyekî aşîti ve bide biçarekirin; jiber bi şer û cengê ve tucarî pirsîyarîya Kurd nayêtê biçarekirin. Lê Şovînizma Erebî xwe bi carekê ve ji bona ceng û şer dabû biamadekirin. Herwehaji wê vê carê xwe bi pêşverû ve didate bilidarxistin û wê Kurd û xebata wîyî azadîxwaz vê carê bi paşverû ve li qelem de didate bixistin.

Paşverû û Kevneperestîya Kurd jî her û her wê jî ji alîyê xwe de agirê şer û cengê didatin bidadan û wan li Kurdistanê de dahol û zurna cengê lêdidan û wan fermanên Kevneperestên Rojhilata Navînî bi giştî ve û nemaze yê Şahîşahê Iranê didatin bicihanîn. Vê Kevneperestîya hanê bi carekê ve xwe li ser kirinên xwînmijîya Şahîşahê Iranê de beramber bi Kurd û hêzên pêşverû ve li seranserî Rojhilata Navînî de date bijibîrakin û wan jêre şabaş, dahol û zurna lêdidan.

Herwehaji Impiryalizma Emerî di rêya Kisincer de didate bixwestin, ku ew vê şûreşa hanê ji bona berjewendîyên xwe û derxistina Sovyêtê ji tevaya Rojhilata Navînî û pêrejî ji Iraqê de bide bigorîkin. Herwehaji wê bi pirsîyarîya Kurd ve ji xwe re bi nala kaxezeke listikê ve pê didate biyarîkin.

Borcuwazîya Kurd bi lez û bez ve xwe li ser tevaya mêjûwa Kurd de didate bijibîrakin. Wê taktîk bi sitratîcîyê ve didate bikin û wê sitratîcî bi taktîkê ve didate biveguhertin. Wê Dost û Dujmin bi heh re didatin biveguhertin, ku ev di tevaya xebata azadîxwaza Kurd de bi bê nimûne ve dihate biderkevtin.

Komela me, Komela Xwendekarên kurd li Ewropa de, ya ku wê her û her xebat ji bona ragihandina rewş û zîneta Kurdistanê bi bîr û bawerîya Cîhanê ve didate bikin, herwehaji wê pêrejî xwe bi beşekî ve ji xebata azadîxwazîya seranserî Cîhanê de û pêrejî ji xebata azadîxwazîya Kurdistnê de didate bidîtin. Wê didate bixuyanîkin, ku Dujminên hemû miletan li seranserî Cîhanê de her û her Kevneperestî û hêzên

Impiryalistî têtin biderkevtin. Hîç rojekê ji rojan de xebata Gelekî ji bona zadîyê, serbestîyê û serxwebûna xwe ve di rêya Impiryalistîyê û Kevneperestîyê de nehatiye biserkevtin. Dujminê Kurd yê herî mezin her û her bi Impiryalîyê ve û nemaze bi Impiryalîya Emerîkî û Kevneperestîyê ve û bi taybetî Şahînşahê Iranî ve têtê biderkevtin, yê ku ew her û her bi Xwînmij û Xwînrîjê Kurd û hêzên Pêşverû ve di Rojhilata Navînî de û bi serdejî ve bi Cadermê Impiryalizma Emerîkî ve di Rojhilata Navînî de dihate biderkevtin. Kevneperestîya Kurd weha hatibû biharbûn, ku ew bi dijî her bîr û bawerîyeke weha ve bi ceng û şer ve dihate bidakevtin. Wê Merovên weha bi van bîr û bawerîyên hanê ve bi xurifandî ve didan bixuyanîkirin. Xebata Kurd, ev xebata ku ew weha ji bal seranserî hêzên Pêşverû û Aştîxwaz de piştê wê dihate bigirtin, ew bi bê piştgirtin ve hate bimayîn. Ew bi tenha xwe ve bi pêpişt ve hate bimayîn û bes û bi tenha ve piştê wê piştê wê li Dujminê de hatibûn bimayîn.

Borcuwazîya Kurdî gen û genî xwe date bitenhaxwekirin. Wê pîlanên Rêjîma Faşîyî Iraqê dane biserxistin. Di encamê dawî de wê xwe bi werîsê Hevalbendên xwe ve date bidarvekirin û pêrejî wê şûreşa Kurd date bixistin.

Rêjîma Faşîyî Basî ev kêsa hanê li Kurd de ji xwe re date bianîn û wê şerekî germ û dir li Kurdistanê de date bivêxistin. Ew bi pêşverû ve dihate biderkevtin û Kurd jî bi paşverû ve dihate biderkevtin.

